# ALÎKARÎYA BI BAWERÎ

Bêpeyivîn, bêxewî, nedilxweztina Xwarinê, dijwariya komkirinê, nefret, şerm, Tirs, hesta tawan û bê hêziyê, bîranînên dubarekirî yên nedilxwaz ên kiryara şîdetê, tecrîda civakî an nekarîna kar reaksiyonên »normal« in ji bûyerek »ne normal« re.

Yên bandor bûne dikarin mîna li **Frauenberatungsstelle Oberhausen** (Navenda Şêwirmendiya Jinan li bajarê Oberhausen) li Demek nêzîk piştgiriyê bibînin.
Telefon **0208 209707** / E-Mail **info@fbst-ob.de**

**Demên Şêwirmendiya bi Têlefonê**
Duşem, demjimêr 9 – 12 / Çarşemê, demjimêr 14 – 17
Pêncşem, demjimêr 9 – 12 / Înê, demjimêr 13 – 15
Li derveyî van deman li ser makîneya bersivdayînê ji kerema xwe peyamekê bihêlin û Şêwirmend dê di zûtirîn dem de li we vegerin.

## EWLEHIYETA ŞOPÊN NENAS (ASS)

→ **Evangelisches Krankenhaus Oberhausen**
Klînîka Jinolojî û Zarokbunê
Virchowstr. 20 / 46047 Oberhausen
Telefon 0208 881-0

## ALÎKARÎYA BI BAWERÎ

→ **Frauenberatungsstelle Oberhausen**
Helmholtzstr. 48 / 46045 Oberhausen
Telefon 0208 209707

## ŞÊWIRMENDIYA TELEFONÎ

→ **Telefona Şêwirmendiya canî**
0800 111 0 111 / 0800 111 0 222
→ **Telefona Alîkariyê- Tundîya dijî jinan**
08000 116 016

## PARASTINA QURBANÎYAN

→ **Weisser Ring Oberhausen**
Telefon 0151 54503980

gefördert vom:

Ministerium für Kinder, Jugend, Familie, Gleichstellung, Flucht und Integration des Landes Nordrhein-Westfalen

weşandin: Navenda Şêwirmendiya jinan û Nivîsgeha Derfetên wekheviyê a Bajarê Oberhausen

# NENAS ŞÛNPÊ EWLEHÎ

## PIŞTÎ TAWANKARÎYEKE SEKSÎ

# RASTÎYÊN GIRÎNG

Birîn û Şopên Tund û Tîjîyê di Çarçoveya Muayeneya pizîşkî/dixtorî bi qanûnî têne belge kirin û bi karanîna koma edlî tên ewleh kirin.

Di dema Muayeneyê de, Encamên gengaz ên Êrişê – wekî Enfeksiyona bi HIV (Kêmasiya immunodefîlê- Êdz) an Nexweşiyên din ên bi Kiryara Sexi re tên veguheztin û her weha fikarên li ser ducaniyek nexwestî û karanîna kontraceptifek paşê – dikarin werin nîqaş kirin. **Piskinîn-Muayene- a bênav, bi bawerî, bi dilxwazî û belaş e.**

Yên bandor bûne di heman demê de li ser alîkariya derûnî-civakî jî wê bêne agahdar kirin.

Di Demeke paşîn de Gilî dikare were tomarkirin.

# GAVA BIRYARDANÊ

Yên ku bandor li wan bûye divê derhal piştî Kiryara Tund û Tîjîyê biçin Nexweşxaneya ku navê wê li pişta vê rûpelê, **û heger naxwazin pêşî gilî/Şikayet bikin**, karin di destpêkê de raporekê ji /Ewlehiyeta Şopên Nenas (ASS) bigrin.

**Ji bo ewlehîkirina Şopan, girîng e ku meriv Cilan neguhere û qasî ku bibe, serê xwe neşon.**

Şop/Şûnpêyên şîddetê li Enstîtûya Tiba Edlî ya li Dusseldorfê 10 salan têne ragirtin û di rewşa Gilînameyeke sûcdarî de paşê dikarin werin vexwendin.

Piştî lêpirsînê, yên bandor bûne agahdarî û hûrguliyên têkiliyê ji Navendên Şêwirmendiyê û dezgehên parastina qurbaniyan distînin.



# GILÎNAME ERÊ AN NA?

Piraniya Kesên bandor bûne piştî Tawankariya seksî pir di bin Ştrês de ne, û ji wan re dem hewce dike ku fêm bikin ka çi qewimiye. **Ji ber vê yekê divê biryara gilî/Şikayet kirin an jî negilî kirin bi baldarî were nirxandin.**

Şêwirmendiya pîşeyî, mîna Navenda Şêwirmendiya Jinan, dikare bibe alîkar ku biryarek layîq bê standin.

Şikayet kirin/Danîna gilî bi dilxwazî ye. Gava ku ji hêla rayedarên bicîhkirina qanûnê ve were zanîn, lêbelê, divê ev were şopandin û nayê vekişandin. Pêdivî ye ku meriv berî şandina Giliyê li Şêwirmendiya hiqûqî bigere. Di her rewşê de, Ewlehiya Şopên Nenas (ASS) destnîşan dike ku delîl di pêvajoyeke cezayî de paşê wekî delîl dikare were bikar anîn.